# Nûçenameya Yekmal

**Malbatên Rêzdar,**
**Bi vê nûçenameyê, em dixwazin hinek agahî û pêşniyaran bi we re parve bikin ji bo jiyana we ya rojane di nav malbatê de û gazî we dikin beşdariyê.**

**Werin em bi hev re vê demê li pişt xwe bihêlin!**

## Pêşniyarên rojane
## Lîstin bi Zarokan re

**"Mirov tenê temamî dibe mirov, li cihê ku dilîze."**
**- Friedrich Schiller**

Di vê nûçenameyê de, lîstin ew e ku zarok li dinyaya derdora xwe fehm dikin, xwe baştir nas dikin û bersivan peyda dikin ji bo pirsên xwe yên derbarê jiyana rojane de.
Dema lîstinê de, gelek derfet çêdibin ji bo mirov bi hestên cuda serkeve û lihevnekirin û pevçûnan çareser bike. Ji bo vê:

1. **Bibin mînak ji bo zarok:**
   Ji bo zarokên xwe bibin mînak (model) û bihêlin bila hestên hem erênî (pozîtîf) hem jî neyînî (negatîf) derkevin pêş. Dema lîstinê de, hawirdoreke erênî ava bikin û her tim ji dil bin. Nîşanê zarokên xwe bidin ku dikarin bi rihetî hestên xwe derxin.

2. **Hestan nas bikin û bi nav bikin:**
   Bi zarokên xwe re derbarê hestên wan de biaxivin û her tim guh bidin wan. Nîşanê zarokên xwe bidin ku dikarin bi rihetî hestên xwe derxin.
   Hestên wek kêf, tirs, hêrs û xemgînî bi rihetî û bi awayekî vekirî dikarin werin nîşandan û parvekirin.
   Ji zarokên xwe bipirsin di lîstikê de çi pêk tê û hestên çawa derdikevin.
   Bo nimûne:
   "Li gorî te, ev kulîlk çima evqas xweşik e?"
   "Li gorî te zarok çima kêfxweş e?"
   Tişta girîng ev e ku zarokên we fehm bike carna hinek hest bi hev re derdikevin, mîna hêrsbûn û xemgînbûn.
   Her wiha, hûn jî hestên xwe nîşan bidin û ji dil bin.

**3. Zarokên xwe erê bikin û pesnê wan bidin dema lîstinê de:**
Çavê xwe û guhê xwe baş bidin zarokên xwe. Dema hûn bi zarokên xwe re dilîzin, bi tiştên din re eleqedar nebin.
Dema zarokên we tiştekî taybetî gelek baş û balkêş çêkiribe, ji wan re bêjin û nîşanê wan bidin ku hûn serkeftinên wan dibînin. Bo nimûne: “Bijî! Te gelek xweş çêkiriye!”

**4. Ji bo hestan cih û derfet ava bikin:**
Hekê zarokên we di lîstikekê de winda bike û hêrs be, jê re bêjin, “Ev tenê lîstikek e.”
An jî derfetan çêkin ku zarok hestên xwe nîşan bidin.
Bo nimûne, hûn dikarin “quncika hêrsê” diyar bikin ji bo ku zarok hêrsa xwe li wir derxe, an jî “quncika rojê” ji bo zarok gotinên xweş ji hev du re bêjin.

**5. Lîstina bi hevalên xwe re**
Bila zarokên we bi hevalên xwe re jî bilîzin, ji bo ku bikarin xwe bixin şûna kesên din de û hestên xwe pêş ve bibin.
Ji wan bipirsin:
“Lîstina te bi …. re çawa bû?”
“Hestên çawa bi te re çêbû?”
“Kêfa te xweş e bi … re?”

**6. Wext bidin zarokên xwe:**
Ji zarok re wext hewce ye ji bo ku li gorî xwe bilîzin û hestên xwe bi dilê xwe nîşan bidin. Dema lîstinê de, wext bidin zarokên xwe ji bo li gorî dema xwe tevbigerin.

**Pêşniyara Pirtûkan**
**“Dinozorek hestên xwe nîşan dide”**

## Pêşniyarên Lîstikan

### Pandomîm: Hestên bi Rûyê Me

Ji zarokên xwe bipirsin, bila hesta we ya wê gavê texmîn bikin. Niha bi rûyê xwe hestekê çêkin (navê vê lîstikê pandomîm e); bo nimûne bi kêfxweşî, kenîn an jî reqsê. Paşî ji zarokên xwe bipirsin bila hesta we texmîn bikin. Hekê zarokên we hesta we rast texmîn kiribe, jê bipirsin ka çawa texmîn kirin. Niha jî dema zarokan e, divê ew hestekê çêkin bi rûyê xwe û hûn texmîn bikin.

### Pispisa Berguh

Navê hestekê pispis bikin ber guhê rastê yê zarokekê, bo nimûne, xemgînî, kêfxweşî an jî sûprîz. Navê vê lîstikê Pispisa Berguh e. Zarok jî wê gotinê pispis dike guhê rastê yê zarokek din û wisa wisa dewam dike heta kesê dawî. Divê kesê dawî, wê hestê bi rûyê xwe (pandomîm) nîşan bide.

### Lîstikên bi Laşê Mirov

Ji zarokên xwe re biaxivin derbarê laşê xwe ji bo ku mirov baştir fehm bike ka laşê mirov û laşên kesên din çi nîşanê me didin. Reaksiyonên çawa ji mirov re hewce ne, dema kesek ji sekna laşê mirov fehm dikin ku ew mirov xemgîn e?

# NûçenameyaYekmal

## Dê û Bavên Rêzdar,
## Xebateke me ya nû heye

**Di hefteyê de 2 rojan em xebata alîkariya dersan û piştgiriya zimanî ji bo almanî çêdikin ji bo zarokên diçin dibistanê.**

**Em alîkarî didin...**

**ji bo hemû dersên dibistanê û mijarên rojane yên dibistanê di xwendin û nivîsandinê de**

**Kengî?**
**Rojên Sêşem û Pêncşeman**
**Saet di navbera 14:00 - 17:00 de**

**Li Kû?**
**li Yekmal e. V.**
**Waldemarstrasse 57, 10997 Berlin**

**Serlêdana xwe li ser vir hûn dikarin çêkin:**
**nachhilfe@yekmal.de / 030 61625848**

# Ferhengok

| | |
|---|---|
| Lîstik | Spiel |
| Derfet | Möglichkeit |
| Lihevnekirin | Konflikt |
| Hest | Gefühl |
| Girîng | Wichtig |
| Quncik | Ecke |
| Laşê mirov | Körper |
| Piştgiriya zimanî | Sprachförderung |

**Hekê peyveke ku we fehm nekiribe li ser vê nûçenameyê hebe, hûn dikarin ji me bipirsin!**